

Lêgerîna mijara di jîngehên penaberan de pevçûn: Encam

Bi vê lêgerînê me xwest em hînbibin di jîngehan de bê pevçûnên çewa pêktên û di dema pêş de ewê çewa pêşî lê bê girtin. Ji ber vê yekê me li Renabakur Vestfalya bi temamî serlîlêdana 33 jîngehan kir û bi 220 kesî re hevdîtin pêk anî. Di nava vana de, şêniyên jîngehê, personel, hêzên ewlekariyê, xebatkarên paqijiyê, memûrên dewletê û xebatkarên organizasyona şewirmendiyê hebûn.

Bi vê lêgerînê, ji bo em baştir bi hev re bikaribin bijîn me van pêşniyaran pêkanî û ragihand siyasetê, rêveberiyê û kargerên jîngehê:

Jîngeh û di beşên jîngehê de strandin û zelalkirina pêvajoyên îltîcakinê.

Sedema piraniya pevçûnan ji ber sitrandina jîngehên mezin û pêvajoya îltîcakinê pêk tê. Ji ber vê sedemê em, ji bo di jîngehan de an jî di jîngehên girtî de bi pêdiviyên re eleqedar bibin û çareser bikin pêşniyaran pêşkêş bikin. Rewşa divê bê misogerkin; pêvajoya penaberan a îltîcakinê divê bi wan bê fêrkin û agahiyê bistînin e. digel vê yeke, ji ber ku nediyarî rê li ber giraniya derûnî vedike, divê pêvajo bi lez be.

Hilbijartina bi hev re û vîna azad divê bê destekirin

Di gelek jîngehan de ji bo şêniyan derfeta bi hev re biryargirtin nayê dayîn. Ji ber vê yeke bi şêniyan re acizî û hestên bêçaretîyê peyda dibe. Lê belê şênî di jîngehan de ddiv jiyana xwe di binê berpirsiyariya xwe de pêk werînin û pêdiviyên wan cîdî bînin. Sererastkirina odeyan û hilbijartina cureyên xwarinê jî di nav de ye. Hemû şênî giliyên xwe yê li hember merciyeke, ji rêveberên jîngehan cuda, li gor xwesteka xwe, bi zimanê xwe, ji bo pêşî li îstîsmariya hêzê bê girtin û ji ber cudahiya ziman gilî neyên astengkirin, divê bînin ziman.

Pêkanîna standartên qalîteyê

Pêdiviya jîngehan bi standardên asgarî heye. Kalîfîkasyona hemû xebatkaran li gor karên wan û bi zagonî divê were destnîşankirin û derfeta bi pêşxistina perwerdeyê divê bê dayîn. Agahiyên şênî yên berê li saziyên eyaletê hatine tomakirin (mînak: nexweşîn) ji bo pêşî li şaşfêmkirinê bigirin û ji bo şênî û xebatkaran zêde newestînin, bi alîkariya formên standartkirî divê bîn ragihandin ji bo jîngehên yekîtiya eyaletê.

Ewlehî dayina ji bo muameleya wekhev

Hemû şênî divê muameleya wekhev bibînin. Divê di navbera xebatkaran û şênîyê de pêwendiyên bi hurmet û zelal were pêkanîn. Teklîfên destekirinê (mînak: kursên ziman) divê ji hemû şênîyê re vekirî be. Qaîdeyên ji bo pêşî li xerakirinan bê girtin hatine çêkirin divê ji hemû mirovan re zelal be û ji bo her kesî yek bi yek derbasbar be.

Ji bo mexdûran parastin

Tundî, bi taybetî dema tundiya di nav malbatê de û tundiya zayendî pêk tê, hemû mexdur divê alîkariya profesyonel bigihê wan. Cihên ku ji aliyê şênîyê ve wek bêewle tê diyarkirin (mînak: kabîneyên dûşê yên nayên radan, cihên tarî û xewle) divê di jîngehan de divê nebin. Cihên wisabin jî divê binyata wan bîn guhertin.

Di derheqê lêgerîna me de, di gelek rojnameyan de û li ser înternetê agahî hatiye dayîn. Ji bo di jîngehan de jiyan baştir bibe, bi xebatkarên jîngehê, xebatkarên rêveberiyê û siyasetmedaran re axaftinên ku me pêkanîne emê berdewam bikin.

Di lêgerînan de kesên ku alîkariya me kirine em spasiyên xwe pêşkêşî hemûyan dikin!

Ji bo pirsên xwe hûn dikarin li ser navnîşanên jêr bigihîjin me:

Dr. Simone Christ, simone.christ@bicc.de
Dr. Esther Meininghaus, esther.meininghaus@bicc.de
Tim Röing, tim.roeing@bicc.de
Tel: 0228 91196-28

www.bicc.de